

# زبونه



دیا جوان

هه لیهست

ژبۆته





**ژبۆته**

**هه ئهسته**

**دیا جوان**

2012



**دیاری**

□

□

**هه ئه به ستین منین ده لالی**

**ئه ز هه وه دیاری هه می جه ژژیکه رین هه ئه به ستا کوردی دکم**

**هه گه ر که س نه مابی**

**□□ ئه ز هه وه دیاری خوه دکم**

□

□

**دیا جوان**



## ناشەرۆك

50	پېشوازی	9	پهیمانا بېكفه ژبانی
51	گۆتن	10	ژبانا مه
51	گونډ	12	دهنگ
52	رۆنی	13	ژ بو گوړئ من جوان
52	به‌رزانی	14	چه‌ژن
53	نافین پېشی	15	نیشان
53	گولاډ	16	چما
53	وه‌لاتۆ (1)	17	ئەشین
54	وه‌لاتۆ (2)	18	هین من چ دڤئ
54	هیقی	20	هه‌لبه‌ست
55	ترس	21	دئ من (1)
55	ژ جیهانی ره	22	پیرئ
56	ئازادی (1)	23	گازندهك ژ باڤئ جوان
56	ئازادی (2)	24	هه‌وی
56	شه‌هید	25	هه‌رسی رۆژین گرتیگه‌هئ
57	سه‌رنامه	27	راپه‌رین
57	ژیان	28	گۆهتن
57	ئەشین	29	مالا من
58	هه‌لبه‌ست (1)	30	باڤئ جوان (1)
58	هه‌لبه‌ست (2)	33	دئ من (2)
58	هه‌لبه‌ستین من	34	زمانئ کوردی
59	گول	35	خوه‌دا
59	نه‌زانی	36	هوون
60	رووپه‌ل	37	مه‌رده‌جان
60	دئ من	38	دارا مرادا
61	رئ	40	هه‌فالتی
61	ئەڤ پینووس	41	دارا مازی
62	شیرت	42	باڤئ جوان (2)
62	مرن (1)	44	قامشلۆکی
62	مرن (2)		هوور و موور
63	زارۆکی	49	چاڤ
63	ل گوندئ مه	49	کراس
64	پاکرده‌وان	49	دهم
	هوور و موور	50	خانی
65	به‌شئ بئ ناڤ	50	پینووس



## په یماننا پیکغه ژیانن

□

□

روژا 1966/5/5 ده □

□ □ ل بازاری قامشلو، تاخا قدوور بهگ، □

□ □ ل بهر روڼاهیا له مپه که چل نه مرو، □

□ □ ب شه هده بوونا □

□ چار دیواران و بانه کی کژووله ک □

□ بیر و چرک و ههردوو دهولکین وی، □

□ دارا تووی، □

□ ته نوور ب شیشا وی څه و □

□ □ ب نامادهیا مالباتا مه، □

□ ل بهر دهستی مه له براهیم، □

□ □ مه

□ په یماننا پیکغه ژیانن □

□ □ موهر کر □ □



هین ب دهان ههلبهست  
 ال پشتا ده ری ههستی من  
 راوهستاینه،  
 بقی نهقی  
 ههر کس وهلاته کی وی ههیه،  
 لی یین من ب خوه  
 ددو نو  
 یی پیشی ههر کوردستانه،  
 یی ددوان  
 باقی جوانه

## دەنگ

□

□

□

□ □ ئەز

□ □ نەما دەنگى خوه دهبيزم □

□ □ نەما دەنگى دلى خوه دهبيزم، □

□ ژ بهر كو □

□ ئەز □

□ □ نەما دەنگى ته دهبيزم □ □

□

□

## ژ بو کورې من جوان

□

□

بلا دنيا ل دوړا تاقې بزيفره، □

□ يان تافل دوړا دنيايې بزيفره، □

بلا خه لک ل دوړا دنيايې بزيفرن، □

□ يان دنيا ل دوړا خه لکې بزيفره، □

بلا دنيا ل دوړا من بزيفره، □

□ يان ټه ز ل دوړا دنيايې بزيفرم، □

نه خمه □

مادم □ □

□ دهستي من □ □

□ □ د نافا مستا دهستي ته ديه □ □

□

□

## جهڙن □

□

□

سڀيا جهڙنِ تو زوو وهره □□

دهريءَ دل ڦهڪه و بنهه ره □

دهلهڪ ڙ گول و گهڦه ره □

وهه و جهڙنِ ڀيٺه ب خوه ره □

دا قاسڪي شابيه ب مه ره □

ديدارهڪ مه بيه ڙ خوه ره □

جهڙن ب مه بهختياره □

بهخچي ويءَ ب مه گول و داره □

فلهڪ دوسته نه نهياره □□

□

□

## نیشان □

□

□

□ دهما خویدان ژ ټه نیا خوړتان دباره، □

□ نیشانا که د ووهستانی یه □□

□ دهما په لپښ داران دوه رهن □

□ نیشانا پاییزی یه □□

□ دهما روڼدک ژ ټاسیمانان دبارن □

□ نیشانا زقستانی یه □□

□ دهما خوناف ل سهر رووکی ټه گولان پالغه دده □

□ نیشانا بوهارى یه □□

□ دهما فرمیسکین من □

□ ب سهر لیقین من ټین گرنزی ده دبارن □

□ نیشانا ټازادی یه □□

□

□

چما □

□

□

□

گهلۆ چما ههزاری سینگان بی دل مانه؟ □ □  
و □

ب ههزاری دلان □

□ د سنگا من ده □ □

□ ب جه بوونه؟ □ □ □

□

□

# ئەفەين □

□

□

د مەشەكى ۋ دە □

□ خەلكى ۋ دۆزا نان دكر □

□ دەما □

□ زەريە كە نەدلگرتى ديتن □

□ بەرى ۋ خوە گوھەرتن و □ □

□ دانە سەر پشتا وى □ □ □

## هين من چ دڻي

□

من □

□ اب نهينووکان □

□ کهڦر کولان □

□ اب چافان □

□ کهلهم هلکرن □

□ اب لنگان □

□ دهر د گيره کرن □

گوھتنيں من □

□ ال سهر تههتا ڙي □

□ شين هاتن □

ستريان □

□ د بن لنگي من ده □

□ کوليلک دان □

ناخ □

□ د مستا دهستي من ده بوو توره □



□

## ههلبهست □

□

□

□

دهما ههلبهستهك دزی □

چافی من گول و کویلکان دبارینن و □

چل ملیوون دل □

□ ال بهر گورمه گورما دلی من □

□ □ □ □ □ دکهفن دیلانی □ □ □ □ □

## دلیّ من (1)

□

□

هنده دلیّ من □

□ □ فہرہہ □

جہیّ ئہرد و ئہزمان □

□ □ د ہوندریّ وی دہ ہہیہ □

لیّ □

□ □ ل مروّقہ کی بیبہخت تیّ ہہؤ و □

□ □ وی ب سہر ہہؤ دہ دگوقیشہ □

□ □ تا کو قرچہ قرچیّ ژ پہراسویّ وی تینہ □ □

□

## پیری

□

□

□

من ب درانیڻ خوه □

□ کزوان دشکاندن □

دا کو کاکلان ژیره □

□ بهرهه ڦ بکم □

ب خوه شهبه ختانه □

□ دبوومه کوپالی د ب چه نگی وی ده □

به شدار بوو د روڼاهیا چافی من ده □

لی، هه ر ئیغار □

ئه ز ل سه ر باسکین چیرو کین وی □

دچوومه سهیرانگه ها دیرو که که کوور و دوور □

□

## گازندهك ژ بائی جوان

□

□

چاوا تو چوویی □

□ ته ئهز کوشتم و هشتم □

ته دزانی □

□ چاوا تو ب من ره بژی □

لی من نه دزانی □

□ کا ئهزی چهوا ب ته ره بمرم □

□ جانی ته بوویه پهره نگهک ئاگر □

□ خوه د بن جانی من ده قهشارتیه □

□ روژا یازدههی مهها ههفتا دوههزار و دهها □

□ من تاما ئاگر ناس کر □

□ ژ وی روژی قه □

□ پیتا ئهقینا ته پیکهتیه □

□ تا کو هشک و تهر ئین ژبانا من ههمی □

□ اب ههقره بشهوتینه □ □

## ههوی

□

□

□

د شهقا داوه تا ههویا خوه ده □

دایکا من دگوت □ □

چما دگوتن □ □

ئاگری دوژه هی د وی دنیی ده به؟! □ □

گهلو ما ئهف چیه ئهز د ناؤ ده؟ □ □ □

یان ئهز مریمه □ □ □

بی کو ئهز ل خوه های بيم □ □ □

یان ئهو دنیا ژی بوویه ههوی و □ □ □

هاتیه سهر قی دنیایی □ □ □

□

## شهرسی روژین گرتیگه سی

من دزانی ههر کو  
چاره کی دلی من دهاته شکاندن  
ب دهها  
دهستی زهریین کوردا برین دبوون  
ئهو که قری کو سه ری من لی ددان  
دبوو له ههک سابوونا کزوانا  
ل سه سه ری من دهلهها  
ئهو دلویین کو ژ ههردوو چاقین من  
دبارین  
ئهوا هنار کی رووی من  
ئاؤ ددان  
دا کو جوانی ژ وان  
بار نه که  
ههر کو تاما دهقی من  
تههل دبوو



## راپهرين

هەر کو گوټنه که من دهلاويستن  
وهريسهک دشهوتي  
هەر کو موويهک ژ سهري من هلدکرن  
اب دهان کهزيين رهش رادپهرين  
هەر کو چاقه کی من دکولان  
چياک د شووني ده ههشين دبوو  
دهپي سينگا من فهکرن  
وهلاتهک د هوندر ده ديتن  
سهري پينوسا من ژيکرن  
خوبنا وي بوو ئهوره کی ههشين  
گول و گهنم  
ناشتي و نازادي  
ل سهرانسهري جيهاني  
باراندن

## گوشتن

هین ل وهلاتی مه  
گوشتن دبارن  
دبن لهی  
وههر چهنده کی  
بنیاتا مالا باقی زهریه که دلدار  
هلدکه و  
ل بهر خوه دبه

## ملا من

□

□

من ملا خوه □

□ اب قینى ئافا کریه □

□ اب خهم و خهونان سه یانديه □

□ ژ ده یاخى دهرى و په نچهره کریه □

□ اب رست و ههلبهستان □

□ گرش و ستوون کریه □

□ اب ئه قینى کلیت کریه □

□ کلیته ک ب من ره یه و □

□ یا دى □

□ من دابه بارانى □

□ بین دى □

□ ل ئازادیخوازین جیهانى دابهش کرنه □ □

□

□

## بائىؑ جوان (1) □

□

□

□

من دگوت قهى ت جارى □

□ دارا مازى هشتك نابه □

من دگوت ت جارى □

□ كه قرين گوندى مه پير نابن □

من دگوت ژ خوه ت جارى □

□ استيرك رانازن □

□ و برينين من جاره كه دى □

□ هشير نابن □

من دگوت قهى ت جارى □

□ بينووسا من لال نابه □

ده وهره لو! ده وهره □

□ مالاوؤ! چاقى من و فان هيستان □

□ ژ ريا فه گه را ته □

□ قهرمين و وهستيان □

□ ده وهره لو □

ٺهز ب روڻد کيڻ خواه ده سميڙ دگرم  
 کي ديڙه دهردي ته بي دهرمانه  
 و چوونا ته بي قه گهره  
 هه ي لي لي! هه ي لو لو  
 هه ي لي لي! هه ي لو لو  
 ده وهره لو  
 تي هه نه کي خواه ل کي بکي!  
 ب خودي  
 ههر ههفت برا  
 و ههر پينج خواهڪ  
 ههر شهنش زاروڪ  
 و ههر چار ديوار  
 جيران و کولان  
 بالگه هي ته  
 سهعت و بهر چاڦکين ته  
 هه مي زي وه که من ديڙن  
 ده وهره لو  
 ده وهره لو  
 ده وهره لو  
 بهريا کو ٺاگري مرنا خوڀان

خهونین من ههمیان بشهوتینن

ما تو جاری

پسمامان خوه

ژ بهر سوژین دوتمامان دانه ئالیکى؟

ده وهره لو

ب خوهدى، ئەز دترسم بمرم

ههگەر روژه کى

ئەز ههست بکم کو

فایه تو مریى

2011/7/11

سالڤه گهرا کوچکرنا

خوهدى ژى رازى باقى جوان

## دلیّ من (2)

□

□

□

□□ وهرن

□ نیژیکی ئیشا من روونن

□ دا

□ هوون فیّ ئەفینا برچی ببینن

□ دا

□ هوون فیّ ئەفینا جوان بپه‌لینن

□□ ئەزیّ چاوا ژێ بيمه شووشتن

□ هەر دلەك دل دكه‌قه دلەكی

□□ دلیّ من دل كه‌تیه چل ملیوّن دل

## زمانی کوردی

□  
□  
□

زمانی دایکی  
ل سەر دهقی مه  
هەر پی بنقیسه و

چەندی شیرینه  
وهك هینگینه  
هەر پی بخینه

زمانی کوردی  
ئەم خوهدیی وینه  
ههگەر مه بهردا

ناسناما مهیه  
ئەو خوهدیی مهیه  
مه چ تونهیه

دقی بزانی  
ئەو مال و ملکی  
مانا مه، هەر بو  
مروڤ و خاکه

چەندی بوهایه  
باڤ و کالایه  
قا سی تشتایه  
ئەو یا سسیایه

## خوهدا

□

□

□

ئەي خوهدا □□

تو ب وي كي □

□ ئەوي كو ناقي خو ل كهسي نه كرى □

□ بدى خاترى هەر شههيدى نهمرى □

□ ژ بو خزان و سيويان □

□ ژ بو بندهست و برچيان □

□ بدى خاترى مهه و سالان □

□ لاقزين هەر پير و كالان □

□ تو بدى خاترى □

□ شه مى، يه كشه م و دوشه مى، □

□ سيشه م چارشه م، پينجشه م و ئينى □

□ بهرى بمرم □

□ تو قى خهونا من □

□ پيكيينى □

□

## هوون

□

□

روڻديڻ من □

دهردڻ من ئاقددن □

ئەز □

دهردڻ خوه خوهدى دكم و □

□ □ □ □ مەزن دكم □

وان □

ل پشتا خوه دكم و □

□ □ □ □ ل دورا دنبايي دگەرينم □

ئەز وان □

د ناف خهونڻ خوه ده دچينم □

□ □ □ □ ژ وان ره دلورينم □

□ □ □ □ ب ههستي خوه □

□ □ □ □ وان دنخومينم □

ژ بهر كو □

□ □ □ □ دهردى من هوون □

## مهره جان

□

□

□

چ روژه که سار و سه‌قم بوو □

چهندي پیدقیی گوتنه که گهرم بووم □

ئاگر د بن چه رمی من ده فیکه تی بوو □

دهنگی بیده‌نگیا من دگها ئاسیمانی هفتی □

قالاهی، هییدی هییدی، ژيانا من تژی دکر □

مرنی ب هردوو دهستان ل ده‌ریی ههستی من دخست □

که فنی هفتی و پینج ههلبه‌ستان هاتبوو چیکرن □

هفتی و پینج به‌هرمه‌ند ب هاتم به‌رازی ره

چه‌میان سهر ئا‌خا مهره‌جانا سی‌زده‌ها

ل بازاری قامشلو □ □

## دارا مرادا

□

□

روژه کی،

من ژى قهستا دارا مرادا کر □□

چقا ئەز ل دورى زيفريم،

من ديت کو شاخهک ژ من ره نهمايه،

دا ئەز تهريشا خوه پى قه گريدم □□

من ژ دارى پرسى □□

خوهديين قان تهريشان چ ژ ته خوهستنه؟ □

ل من قه گهراند و گووت □□

هنهکا ژ من خوهستيه زاروک ژ وان ره چيبين،

هنهکا خوهستيه ميرى وان ژ نهكى نهينه سهر وان،

داخوازا هنهکا کو بهرى وا يى پيشى نير به،

هنهکا قيانه ژ چاقان بينه پاراستن و

گهلهکان ژى ژ وان خوهستنه بهره کت تیکه قه مالى وان،

هنهکا ژى خوهستيه ريويين وان قه گهرن،

و هنهکا لاقر کر نه کو نهخوهشين وان ساخ بن

..... و هتد.

من ژى خوه ئاقبیت بهختی داری و

داخوازا خوه ژى ره گوت و

تهریشا خوه ل قورمی وی گریدا.

هه و من دیت،

کو داری پاچک و تهریشین ب شاخکین خوه فه ههمی وهشانندن،

رههین خوه ژى ژ ئهردی هلكشانندن

دارا مرادا،

بی مراد چوو و

کەس نزانە ب کوو فه!

## هه‌فالتی

هه‌فالتی مینا پرتوو‌کخانه‌یا مالی یه  
خوه‌دی‌یی پرتوو‌کخانی هه‌ر چه‌نده‌کی به‌ر خوه‌ دده‌ پرتوو‌کخانا خوه‌ و  
وی‌ قالا دکه  
هوند‌ری پرتوو‌کخانی‌ پاقر دکه  
یه‌ک و یه‌ک پرتوو‌کین خوه‌ ژ توژی دوه‌شینه  
جاره‌که دی وان ل پرتوو‌کخانی‌ قه‌د‌گه‌رینه  
هه‌ر جاره‌کی هه‌نه‌ک گه‌لاش مه‌لاش ژ نا‌قا وان دده‌ هه‌ف و تا‌قیژه  
هه‌نه‌کا ژ سه‌ر ره‌فکا ژور داد‌خه، ل سه‌ر یا ژیر دده‌ینه و هه‌نه‌کا ژ  
ره‌فکا ژیر هل‌دده‌ و وان ل سه‌ر یا ژور دده‌ینه  
لی هه‌نه‌ک پرتوو‌ک هه‌نه، هه‌ر و هه‌ر مرو‌ق‌ب ریز راده‌یژه وان، ب  
دلو‌قانی ده‌ستین خوه‌ ب سه‌ر وان ده‌ تینه، توژی ژ سه‌ر وان  
دوه‌شینه، چه‌ند ریزان ژ وان دخوینه و هه‌ر و هه‌ر وان ل سه‌ر ره‌فکا  
ژور وان دده‌ینه.

## دارا مازی

ل وهلاتی مه

خه لک چیدبن و دمرن

چهم ت جاری رانازن

زه فی زهر دبن

ببندهر تژی دبن

خورت، سمبیلین خوه با ددن

که چ کهزیین خوه دهوونن

پیره ژن سه ریپهاتیین خوه دیژن

چیا شهیدین خوه همبیز دکن

ته نی دارا مازی شپیا یه

نوبه تداره

ئه و شاهده

راسه را ههر تشتی یه

ته نی یی ژ وی بلنتر

خوه دی یه.

## باقی جوان (2)

هین

هر سبهه

تو ژ دهری قه تی و

روژ ناما روژانه د دهستی ته ده یه و

تو

نووجه یین گرنگ

ب دهنگی بلند دخوینی

دا کو ئەز ل مه تبهخی

ببیزم.

هین

هر سبهه

دهنگی مغتا ته تی گوھی من

کو تو ژ دهریی ههوشی قه تی و

ئەز دبهزم پیشیا ته

کیسا ژ دهستی ته دگرم

تو ژ من ره دبیژی:

تو دزانی ئیرو من ل سووکی کی دیت؟

ئهز دبیژم:

ژ قامشلو بوو؟

تو دبیژی:

ئهری!

و ئهز پی دکهقم

ناقئ مروق، ناس و جیرانین مه یین بهری

یه کو.. یه کو دبیژم،

ههتا کو تو بیژی: بهلی ئهوه.

هین

ئهم ب ههق ره دادکهفن و

تو ژ من ره دبیژی:

ئهمیرا! دهستی من بگره

دا تو دقان کاشان ده نه کهقی!

## قامشلوکی

کو ته جاره کی توڑا سالان  
ژ سهر پهلی دارین وی  
نه شووشتین  
تو ت جارا نه گریایه، و  
کو تاڤا ته مووز و ته باخی  
دیم و رووی ته  
داخ نه دابن  
قامشلو ته ناس ناکه!  
کو ئاگری تووتنی  
جهدو د ناڤا تلیی ته ده  
چی نه کربن  
ئهزی چاوا ناسکم کو تو  
قامشلو کی یی؟!  
کو ته ژ جرنکی، تا هلیلی  
گاؤ ب گاؤ  
نه پیڤا بی  
چاوا دی تو قامشلو ناس بکی!

هه‌گەر

کو ته هه‌ریا زڤستانا وی هاقینی ژی

مینا هه‌نا زاقاتی

ب جلین خوه قه نه هلانده

تی چاوا دورووڤی خوه ژ قامشلو بستینی؟!

هه‌گەر به‌ریا سه‌عه‌ت دودوی شه‌قی

تو قه‌گه‌رهایی مالا خوه

وی چاوا مالی یین ته ته ناس بکن؟!

هه‌گەر ده‌ستین ته و

چاقین ته و

ده‌ریی ته

ههم و هه‌رده‌م

نه ل سه‌ر پشته‌ی قه‌گری بن

خه‌لک وی چاوا ناس بکن کو تو

قامشلو کی یی؟!



هوور و هوور



## چاڻ

هه گهر هوون نه هيلن،  
تهز قى جيهانى،  
وهك تهز دخوازم بينم  
قان ههردوو چاقان ڙى،  
ڙ رووى من دهرينن.

## کراس

تهو کراسى کو دوھ،  
مه ڙ هيڻيڻ خوه ره درووتى  
ٽيرو ل بهڙنا وان ناي.

## دهم

قى دهمى دلين خه لکى د بهريکى وا ده نه  
رامانيڻ وان د زکى وا ده نه.

## پینووس

چەندی تو

پینووسا خوہ تووژ بکی

ئەو چەند چەکین گران

کوھ دبن.

## پیشوازی

ئیرۆ ب دەهان پینووس د مالا مە دە

خوین د رەهین وان دە

زوھا بوویە

چەندی ل بەر خوہ دکەقم

کو ژ نشکافە

هەلبەستە ک

ل دەری هەستی من خە

ئەزی

چاوا پیشوازی لی بکم.

## گوتن

ٲاماده مه كو هفت سالان  
وي ل پشنا خوه بكم و  
ل دورا دنيايي بگه رينم  
يي كو ژ من ره بيژه كا  
چهند روو ژ بهك گوتني ره هه نه!

## گوند

هين بهنا ناني ته نووري  
د بيقلا من دهيه  
له يستكي زاروكتيي  
ل بهر چاقي منن  
هين شيره تين پيره ژنان ل بيرامنن  
هين رهز و بهز و جوت  
بهرف و باران  
تينه خهوني من  
ژ لهورا دزانم هي تهز گونديمه  
بازارقانيي تهز نه دزيمه.

## رؤنی

مروقیؑ کو

رونیؑ ژ چاقینؑ خوہ وندا دکہ

ژ کولانیؑ دترسہ.

لیؑ، مروقیؑ کو

روناہییؑ ژ دلیؑ خوہ وندا دکہ

کولانؑ ژ وی دترسن.

## بہر زانی

دہما

ئہز

ل بن لنگیؑ تہ روونشتم و

من

کیلا بہر سہریؑ تہ رامووساند

ئہز

ژ بندہستیؑ تاہر بووم.

## ناڤين پيشي

بهري پيشي ئانى  
ناڤي وي كر كوردستان  
يي ددووا  
ناڤي وي كر بهرزاني و  
يي سسيا  
ناڤي باقي خوه لي كر.

## گولاف

من ت گولاف ل بهژن و بالا خوه وهرنه كرن  
پشتي كو ژ من ره گوئن:  
بهنا وهلات ژ ته تي.

## وهلاتو (1)

ئهفينا من ژ ته ره بقاسي ئيشا تهيه  
ژ لهورا ئهفينه كه ئهشكهريه و  
ت كراس ل بهژنا وي نايي.

## وه لاتو (2)

دايک،

خوه قوربانا زاروکان دکن

خوشک،

خوه قوربانا برا دکن

دوتمام،

خوه قوربانا پسمامان دکن

ئه قيندار،

خوه قوربانا هه قوودوو دکن

قيجا هه می ب هه قوره

ب يه ک جاري

خوه قوربانا ته دکن.

## هيقي

باوهر کن!

کو بيلن هيقيه ک ژ سينگا من بوهره ی

سه ر ته هته کی ژ ی

وی شين ببه.

## ترس

ترسا من

ئا ههري مهزن ئهوه كو

روژه كى

قالهه

ژيانا من تژى بكه.

## ژ جيهانى ره

من نه دخوهست كو

ئهز د ددهيا كوردينيا خوه ده

نوق بيم

وندا بيم

لى ما ئهز چبكم

تو دهريايين دى

ئهز

هينى ئاقژه نيا خوه نه كرم.

## نأزادی (1)

نزانم کا ویؑ ئهٔقینا ئازادیؑ  
من ل پھی خوه ببه کووده ریؑ  
لیؑ ئهز باش دزانم کو  
ئہز ژ پھی ویؑ قہ ناگہرم.

## نأزادی (2)

ہہر کو مرؤ  
گاقہ کیؑ ژ ئازادیؑ دوور بکہ قہ  
دیؑ دو گاقان بہر ب مرنیؑ قہ ہہرہ.

## شہہید

ہہر دلوپہکؑ ژ خوینا شہہید کی  
دہریاکؑ ژ گہ مارا بندہستیؑ  
دشوؑ

## سه‌نامه

مالا مه، د سینگا گوند دهیه  
گوندی مه، د سینگا چپی دهیه  
چپایی مه، د سینگا کوردستانی دهیه  
کوردستان، د سینگا من دهیه.

## ژیان

دهما کو ئەم  
ژیانی ل خوہ بکن کافله‌که ویران  
وی هیقی و بیرانینن مه زی  
بن مار و دوو پشتک

## ئەشین

ئەم هەمی قالكه‌ك قانە  
به‌ریا کو ئەقین بکه‌قه هوندری مه

## ههلبهست (1)

ئهو ههلبهستا كو

بهنا ناني ته نووري ژي نهيي

بهنا ئاخى ژي نهيي

بهنا ههلبهستى ژي ژي نايي.

## ههلبهست (2)

چه ندى تيم دا هلوهشم

ههلبهستهك تي دكهقه بن چهنگي من

دا كو ديسا ل سهر لنگي خوه راوهستم.

## ههلبهستين من

ههلبهستين من

ب ناني كوردان خوهدى دبن

دهرس و دهورين خوه

ژ كوچك و جفاتين وان دستين

ل بهر دهري و پهنجهرى وان دپونژن.

## گول

گول

ل خوينا خوه دبووره

ل بهر سهري خوه يي ژيکري و

تهمه ني خوه يي قورمچاندي ژي، ناکه فه

ته ني،

کو وي بدن دهستي ئه فيندهاره کی

يان ژي، دهستي ئازاديوخوازه کی.

## نه زانی

ژ نه زانیا خوه

مه دژمن زانا ددیت

ژ نه زانیا دژمن

ژ وی هه بوو کو

دکاره

مله ته کی

د قوتیکه کی ده

بچینه!

## رووپهل

چهندي دلي من ب فان رووپهلان دشهوته  
دهما كو ئهز تيبين خوه يين  
مينا پهره نكين ئيگر  
د هناقين وان ده  
دچينم!

## دلي من

تهفي كو دلي من  
گوگهك مهزن بوو ژي  
لي، ژ زاروكان پيقه  
كهي نهزاني ب وي بلهيزه  
من دلي خوه  
دياري كهي نهكر  
ژ بهر كو من زانيبوو كو كس ژي،  
ب دلهكي بووي چار پهرچه  
قايل نابه

ری

ری و ریچک  
ل وهلاتی مه  
تهنگ و زراف مان  
ژ بهر کو مه نه دخوست  
ئهم پیل گورین شهیدا بکن و  
نه ژی  
گول و کولیلکا بپه رچینن.

ئهف پینووس

تهنی ئهف پینووس  
کلیتا دلی منه  
تهنی ئه و دکاره  
دهری وی فه که  
بکه فه هوندری وی  
ل ناف دهشت و چایین وی یین  
بی سینور بگه ره.

## شیره‌ت

ژ سبه‌هی هه‌تا ئیغاری

ئه‌ز شیره‌تا

ل زاروکیڤن خوه دکم

ژ ئیغاری هه‌تا سبه‌هی

ئه‌ز شیره‌تا ل خوه دکم.

## مرن (1)

هنه‌ک چی‌دبن دا بمرن و

هنه‌ک دمرن دا بژین.

## مرن (2)

مروڤه‌ک یه‌ک جاری ژ دایکا خوه دبه و تی ژیانی

ههر کهس قی دزانه

لی یا کو کهس نزانه کا وی چه‌ند جارن

د قی ژیانی ده بمره.

## زاروکی

ئەقە پینچی سالە

ئەز زاروکتیا خوە د بن بالگەھی خوە دە دقەشیپرم  
بەلکی روژەکی  
لەشکەر ژ کولانین مە دوور بکەقن  
دا دایکا من بییژە:  
تو زی هەرە بلەیزە.

## ل گوندی مە

ل گوندی مە  
خەلکی زاروکیین خوە  
ژ بەر چاقی حەلیمی قەدشارتن  
دگۆتن:  
چاقی حەلیمی مروقا دکوژە!  
خوەزی و سەد هەزار جار خوەزی  
ئەز ب چاقی حەلیمی بمراما و  
نە ب دەردی خەریبی.

## پاکره وان

ههتا کول ژيانی نه

ژيانا مه دپاریزن

دهما کو ژ ژيانی باردکن

ژيانا وان

ژ ژيانا مه یا بی ژيان ره

دبه ژيان

# هوور و هوور

بهشی بی نائف



• تهنی رووی خه لکی  
نهینکا ههلبه سستین منن.

• چ سووده ژ دهمه که نوو هه یه  
هه گهر ئەم خوو نه کن!

• من رووی قان رووپه لان رهش کر و  
وان رووی من سپی کرن

• ئەقه ههزار ساله  
ئەز ژ بهر دهردان دره قم  
د داوی ده  
ئەز و وان  
راستی هه ق تین

• یی کو تشته ک نه چاندی  
ل هیفیا بارانی ژ نامینه.

• ئەز

ب زماڻى دلىٰ خوه د ئاخقم

• ت جارى

گوٽنىڭ قەلەو و قالا

زكىڭ برچى تپىر ناكڭ

• دقىٰ ئەز ل سەر خوه بگريم

هه گەر كو

من نه زانى

ئەز ل سەر كهسى دى بگريم

• تهنىٰ يىٰ كو ژ بو ژيانىٰ دمره

ئهو دژى

• ئازادى ژى مينا مه

بىٰ جھ و واره

هەر ئەو ل دوړا جيهانىٰ دگهره و

ئهم ژى ل پهى دگهرن.

• گهلو ٿم شههيد خهلات دکن

يان ٿو مه خهلات دکه

• خواهزي بهنقهانا من ٿا داوی

ل بهر دیواره کی ژ دیوارین گوندی مه با

• ٿم ٿهوین چووین

ب خواه ره

ساخ بهیلن

چیتره کو ٿم ب وان ره بمرن

• مروٿ

کو د ناقا ٿیتوونی ده به

چیتره کو

ٿیتوون د ناقا وی ده به

• ٿه ز و ٿهقین جیوینه

ب ههقره چیبوونه

ژ سینگا فان چیان

فرشک بوونه

• تیبین من

د دستین مهردان ده دبن گول و  
د بن لنگین چهپه لان ده دبن بزمار

• وهلات ب مروقی خوه بهایه

مروقی بی وهلات

سیویه کی وندایه و

وهلاتی بی مروقی

کافله کی قالایه

• ئاگری سوپی،

سهرما لاش دکوژه

لا، تاقا ئازادی

سهرما جان دکوژه

• چهندی دلی من مهز نه ژي

لی،

برینا د هوندری وی ده

ژي مهز نتره

• ٲهوڀن ڙ بهر چاڦي مه ڦه ڊمرن،  
د هونڊري مه ده ڦيڊکه ڦن.

• چاڦي من

مينا په له کي ٲه ورن  
ڊکارن ههر زه ڦيه که تي و مچي  
بميڙينن

• ههر کو ٲهز هيڦيه کي ڊچينم  
روڙه ک ڙ ته مه ني من  
ڦه ڊمره

• مروڦ ب خوه

مينا ده ڦته ره کي يه  
روڙ و مه ه و سال  
هه مي ٲيښ و ڙانين خوه  
ل سه ر روو په لين وي  
ڊنڦيسه و  
ڊچه و ڙ مه ڊبووره و  
مه ل شوونا خوه دهيله.

داوی

وہشانین پروژین ہہفشک و ہاریکاری بین  
 رقبہبریا گشتی یا راگہاندن و چاپ و بہلافکرئی  
 رقبہبریا چاپ و بہلافکرئی - دھوک

سال	نافی پھرتوکی	نقیسہر	لایدن	ژ
2012	زمانی دایکی	بہلافوکا سالانہ	کوربہندا سہردہم یا قوتابییان	1.
2012	تیور و تہکنیکین شروفہ کرنا رؤمانی (تیور، گۆشی نیرینی، مؤنتاج، دیالوگ)	ئہمین عہبدولقادر	ئیکہتیا نقیسہرین کورد/دھوک	2.
2012	رائحہ الورد (قصص قصیرہ)	یونس احمد	ئیکہتیا نقیسہرین کورد/دھوک	3.
2012	الکتابۃ بالحبر الأبيض	حسب اللہ یحیی	ئیکہتیا نقیسہرین کورد/دھوک	4.
2012	ئہو ستیرا تہقیای (ہہلبہست)	ئدریس عہلی دیرگزیکی	ئیکہتیا نقیسہرین کورد/دھوک	5.
2012	ہہفودغہری بای	محہمد عہلی یاسین	ئیکہتیا نقیسہرین کورد/دھوک	6.
2012	Hest diaxivin (ہہلبہست)	دہم ہات دیرہکی	ئیکہتیا نقیسہرین کورد/دھوک	7.
2012	د عہشقا تہ دا (ہوزان)	سہلمان شیخ مہمی	ئیکہتیا نقیسہرین کورد/دھوک	8.
2012	دی رویارہکی کھمہ کلیل ژ بو فی دہرگہہی بی و ہلات	فہہیل محسن	ئیکہتیا نقیسہرین کورد/دھوک	9.

2012	رۆژەكی ھو گۆت	خالد حسین	ئیکەتیا نفیسەرین کور د/دھوک	10
2012	داستانە کا ھەلپەسارتی	کومە لا ھەلبەستفانیین گەنج	کومە لا ھەلبەستفانیین گەنج	11
2012	سیما 2	پروفیسور د.سابر عەبدوللا زێباری	رێکخراوا سیما	12

**Ji bo te**

**Hûkûmeta herêma kurdistanê  
Wezareta rewşenbîrî û lawan  
Rêveberiya gşî ya ragehandn  
û çap û belavkirinê  
Rêveberiya çap û belavkirinê-duhok**



- Navê pirtûkê: Ji bo te
- Nivîser: *Diya Ciwan*
- Babet: Helbest
- Dîzayna berg û naverokê: Mes'ûd Xalid Gulî
- Qeware: 15 × 22
- Jimara laperan: 148
- Tîraj: 500
- Nirx: 3000
- Jimara sipardinê: 2217 1 sal 2012
- Zincîre: 24
- Çapxane: çapxana hewar - dihok - kurdistan
- Mafên çapê di parastîne bo rêvebarîya me û xudana pirtûkê ©

# **Ji bo te**

*Helbest*

***Diya Ciwan***

2012



## *Diyarî*

*Helbestên minên delalî*

*Ez hewe diyarî hemî hezjêkerên helbesta kurdî dikim*

*Heger kes nemabê*

*Ez hewe diyarî xwe dikim*

*Diya Ciwan*



## Naverok

Peymana pêkvejiyanê.....	9
Jiyana me.....	10
Deng.....	12
Ji bo kurê min Ciwan.....	13
Cejn.....	14
Nîşan.....	15
Çima.....	16
Evîn.....	17
Hîn min çi divê.....	18
Helbest.....	20
Dilê min(1).....	21
Pîrê.....	22
Gazindek ji bavê Ciwan.....	23
Hewî.....	24
Hersê rojên girtîgehê.....	25
Raperîn.....	27
Gohtin.....	28
Mala min.....	29
Bavê Ciwan(1).....	30
Dilê min(2).....	33
Zimanê kurdî.....	34
Xweda.....	35
Hûn.....	36
Mihrecan.....	37
Dara mirada.....	38
Hevaltî.....	40
Dara mazi.....	41
Bavê Ciwan(2).....	42
Qamişlokî.....	44
Hûr û mûr	
Çav.....	49
Kiras.....	49
Dem.....	49
Xanî.....	50
Pênûs.....	50

Pêşwazî.....	50
Gotin.....	51
Gund.....	51
Ronî.....	52
Berzanî.....	52
Navên pêşî.....	53
Gulav.....	53
Welato (1).....	53
Welato (2).....	54
Hêvî.....	54
Tîrs.....	55
Ji cihanê re.....	55
Azadî (1).....	56
Azadî (2).....	56
Şehîd.....	56
Sername.....	57
Jiyan.....	57
Evîn.....	57
Helbest (1).....	58
Helbest (2).....	58
Helbestên min.....	58
Gul.....	59
Nezanî.....	59
Rûpel.....	60
Dilê min.....	60
Rê.....	61
Ev pênûs.....	61
Şîret.....	62
Mirin(1).....	62
Mirin(2).....	62
Zarokî.....	63
Li gundê me.....	63
Pakrewan.....	64
Hûr û mûr	
Beşê bê nav.....	65



## *Peymana pêkvejiyanê*

Roja 05.05.1966 de

Li bajarê Qamişlo, taxa Qidûr beg,

Li ber ronahiya lempeke çil nemro,

Bi şehdebûna

Çar dîwaran û banekî kijûlek

Bîr û çirrik û herdû dewlikên wê,

Dara Tiwê,

Tenûr bi şîşa wê ve û

Bi amadeya malbata me,

Li ber destê Mele Brahîm,

Me

Peymana pêkvejiyanê

muhrkir.

## *Jiyana me*

Eve çil û çar sale

Ez û tu û tîrêjên tavê

Her sibeh

bi hev re

pêşwaziyê li jiyane dikin

Eve çil û çar sale

Dilê te hêlîna min e, û

Dilê min ji kehniya evîna te vedixwe

Eve çil û çar sale

Xewnên min

di nava mista destên te de

dileyizin û

mezin dibin,

Her ku tu destê xwe bi ser ê min de tînî,

Dizanim ku hîn ez heme, û

Hîn bi dehan helbest

li pişta deriyê hestê min

rawestayî ne,

Bivê nevê

Her kes welatekî wî heye,

Lê yên min bi xwe

dido ne;

Yê pêşî her Kurdistan e,

Yê didiwan

Bavê Ciwan e.

# *Deng*

Ez

Nema dengê xwe dibihîzim

Nema dengê dilê xwe dibihîzim,

Ji ber ku

Ez

Nema dengê te dibihîzim.

## *Ji bo kurê min Ciwan*

Bila dinya li dora tavê bizîvire,  
    yan tav li dora dinyayê bizîvire,  
Bila xelk li dora dinyayê bizîvirin,  
    yan dinya li dora xelkê bizîvire,  
Bila dinya li dora min bizîvire,  
    yan ez li dora dinyayê bizîvirim,  
Ne xeme  
Madem  
    destê min  
        di nava mista destê te de ye.

## *Cejn*

Sibha cejnê tu zû were  
Deryê dil veke û binere  
Dehlek ji gul û geve e  
Were û cejnê bêne bi xwe re  
Da qaskî şabibe bi me re  
Dîdarek me bibe ji xwe re  
Cejin bi me bextiyar e  
Bexçê wê bi me gul û dar e  
Felek dost e ne neyar e.

## *Nîşan*

Dema xwêdan ji eniya xortan dibare,  
nîşana ked û westanê ye.

Dema pelên daran diwerihin  
nîşana Payîzê ye.

Dema rondik ji asîmanan dibarin  
nîşana Zivistanê ye.

Dema xunav li ser rûkê gulan palvedide  
nîşana Buharê ye.

Dema firmêskên min  
bi ser lêvên min ên gîrnijî de dibarin  
nîşana azadiyê ye.

## *Çima*

Gelo çima hezarê sîngan bê dil mane?

Û

Bi hezarê dilan

di singa min de

bi cih bûne?

## *Evîn*

Di meşekê de

Xelkê doza nan dikir

Dema

zeriyeke nihdilgirtî dîtin

Berê xwe guhertin û

dane ser pişta wê.

## *Hîn min çi divê*

Min bi neynûkan

kevir kolan

Bi çavan

kelem hilkirin

Bi ligan

derd gêre kirin

Gohtinên min

li ser tehta jî

şîn hatin

Stiriyan

di bin lingê min de

kulîlk dan

Ax

di mista destê min de

bû tore

Ehniya min

bû muhra kurdîniyê

Her ku ez

helbestekê di ber biskên xwe ra dikim

Bi dehan

qutabiyên Cezîrî

Xanî

Tîrêj û

Cegerxwîn

dikevin cezbeke buhiştî

Hîn min çi divê?!

## *Helbest*

Dema helbestek dizê  
Çavê min gul û kulîlkan dibarînin û  
Çil Milyon dil  
li ber gurme gurma dilê min  
dikevin dîlanê.

## *Dilê min (1)*

Hinde dilê min

fereh e

Cihê erd û ezman

di hundirê wî de heye

Lê

Li mirovekî bêbext tê hev û

Wî bi ser hev de diguvêşe

Ta ku qirçe qirçê ji perasûyê wî tîne.

## *Pîrê*

Min bi diranên xwe

kizwan dişikandin

Da ku kakilan jêre

berhev bikim

Bi xweşbextane

dibûme kopalê di bi çengê wê de

Beşdar bû di ronahiya çavê min de

Lê, her êvar

Ez li ser baskên çîrokên wê

Diçûme seyrangeha dîrokeke kûr û dûr

## *Gazindek ji Bavê Ciwan*

Çawa tu çûyî  
te ez kuştim û hiştim  
Te dizanî  
çawa tu bi min re bijî  
Lê min neizanî  
Ka ezê çawa bi te re bimrim  
Canê te bûye perengek agir  
Xwe di bin canê min de veşartîye  
Roja yazdehê meha hefta duhezar û deha  
Min tama agir nas kir  
Ji wê rojê ve  
Pêta evîna te pêketîye  
Ta ku hişk û ter ên jiyana min hemî yê  
bi hev re bişewitîne

## *Hewî*

Di şeva daweta hewiya xwe de

Dayika min digot:

Çima digotin

Agirê dogehê di wê dinyê de ye?!

Gelo ma ev çiyê ez di nav de?

Yan ez mirî me

bê ku ez li xwe hay bibim

Yan ew dinya jî bûye hewî û

hatiye ser vê dinyayê.

## *Hersê rojên girtîgehê*

Min dizanî her ku

carekê dilê min dihate şikandin

Bi deha

destê zeriyan Kurda birin dibûn.

Ew kevîrê ku serê min lê didan

Dibû lehek sabûna kizwana

li ser serê min di heleha

Ew dilopên ku ji herdû çavên min

dibarîn

Ewa hinarkê ruwê min

av didan

Da ku ciwanî ji wan

bar neke

Her ku tama devê min

tehl dibû

Min dizanî ku

ezê helbestne şêrîntir

birêsim

Hersê rojên birçîbûnê

Newqa min ziravtir bû

Da ku kiras û xeftanên kurdî

Zehftir

li ser bejn û bala min

binalin.

## *Raperîn*

Her ku gotineke min dihilawîstin

Werîsek dişewitî

Her ku mûyek ji serê min hildikirin

Bi dehan keziyên reş radiperîn

Her ku çavekî min dikolan

Çiyak di şûnê de heşîn dibû

Depê sênga min vekirin

Welatek di hundir de dîtin

Serê pênûsa min jêkirin

Xwîna wê bû ewrekî heşîn

Gul û genim

Aştî û azadî

Li seranserê cîhanê

barandin

## *Gohtin*

Hîn li welatê me

Gohtin dibarin

Dibin lehî

Û her çendekê

Binyata mala bavê zeriyeke dildar

hildike û

li ber xwe dibe.

## *Mala min*

Min mala xwe

Bi vînê ava kiriye

Bi xem û xewnan seyandiyê

Ji deyaxê derî û pencere kiriye

Bi rist û helbestan

Girş û sitûn kiriye

Bi evînê kilît kiriye

Kilîtek bi min re ye û

Ya dî

Min daye baranê

Yên dî

Li azadîxwazên cîhanê dabeş kirine.

## *Bavê Ciwan (1)*

Min digot qey ti carî

Dara Mazî hişk nabe

Min digot ti carî

Kevirên gundê me pîr nabin

Min digot ji xwe ti carî

Stêrik ranazin

Û birînên min careke dî

Hişyar nabin

Min digot qey ti carî

Pênûsa min lal nabe

De were lo! De were

Malavawo! Çavê min û van hêstiran

Ji riya veqera te

Qerimîn û westiyan  
De were lo!  
Ez bi rondikên xwe desmêj digrim  
Kî dibêje derdê te bê derman e  
Û çûna te bê veger e  
Het lê lê! Hey lo lo  
Het lê lê! Hey lo lo  
De were lo!  
Tê henekê xwe li kê bikî?!  
Bi Xwedê  
Her heft bira  
Û her pênc xuhik  
Her şeş zarok  
Û her çar dîwar  
Cîran û kolan  
Balgehê te  
Se`et û berçavkên te  
Hemî jî weke min dibêjin

De were lo!

De were lo!

De were lo!

Berya ku agirê mirina xopan

Xewnên min hemiya bişewitînin

Ma tu carî

pismama xwe

ji ber sozên dotmama dane alîkî?

De were lo!

Bi Xwedê, ez ditirsim bimrim

Heger rojekê

Ez hest bikim ku

Vaye tu miryî

**11.07.2011**

***Salvegera koçkirina  
Xwedê jê razî Bavê Ciwan***

## *Dilê min (2)*

Werin!

Nêzîkî êşa min rûnin

Da

Hûn vê evîna birçî bibînin

Da

Hûn vê evîna ciwan bipelênin

Ezê çawa jê bême şûştin!

Her dilek dil dikeve dilekî

Dilê min dil ketiye çil Milyon dil.

## *Zimanê kurdî*

Zimanê daykê            çendî şêrîne  
Li ser devê me        wek hingivîne  
Her pê binvîse        û her pê bixîne

Zimanê kurdî            nasnama me ye  
Em xwedyê wî ne      ew xwedyê me ye  
Heger me berda        me çi tune ye

Divê bizanin            çendî buhaye  
Ew mal û milkê        bav û kalaye  
Mana me, her bo      va sê tiştaye  
Mirov û xak e        ew ya sisayê

## *Xweda*

Ey Xweda!

Tu bi wî kî

Ewê ku navê xwe li kesê ne kirî

Bidê xatrê her şehîdê nemirî

Ji bo xizan û sêwiyan

Ji bo bindest û birçiyên

Bidê xatirê meh û salan

Lavijên her pîr û kalan

Tu bidî xatrê

Şemî, yekşem û duşemê,

sêşem çarşem, pêncşem û îne

Berî bimrim

Tu vê xewna min

pêkbîne.

## *Hûn*

Rondikên min

Derdên min avdidin

Ez

Derdên xwe xwedî dikim û

Mezin dikim

Wan

Li pişta xwe dikim û

Li dora dinyayê digerînim

Ez wan

Di nav xewnên xwe de diçînim

Ji wan re dilorînim

Bi hestê xwe

Wan dinixumînim

Ji ber ku

Derdê min hûn in.



## *Dara mirada*

Rojekê, min jî qesta dara Mirada kir.

Çiqa ez li dorê zîvirîm, min dît ku şaxek ji min re nemaye, da ez terîşa xwe pê ve girêdim.

Min ji darê pirsî:

Xwediyên van terîşa çi ji te xwestine?

Li min vegerand û got:

Hineka ji min xwestiye zarok ji wan re çêbibin, hineka xwestiye mêrê wan jinekê neyîne ser wa, daxwaza hineka ku berê wa yê pêşî nêr bê, hineka viyane ji çavan bêne parastin û gelek jî wan xwestine bereket bêkeve malê wan, hineka jî xwestie rêwiyên wan vegerin, û hineka lavij kirine ku nexweşên wan sax bibin ...û hd.....

Min jî xwe avêt bextê darê û daxwaza xwe jê

re got û terîşa xwe li qurmê wê vê girêda.

Hew min dît, ku darê paçik û terîşên bi  
şaxikên xwe ve hemî weşandin, rehên xwe jî  
ji erdê hilkişandin

Dara miriada, bê mirad, çû û

Kes nizane bi kû ve!

## *Hevaltî*

Hevaltî mîna pirtûkxaneya malê ye  
Xwedyê pirtûkxanê her çendekî ber xwe  
dide pirtûkxana xwe û wê vala dike  
Hundirê pirtûkxanê paqij dike  
Yek û yek pirtûkên xwe ji tozê diweşîne  
Careke dî wan li pirtûkxanê vedigerîne  
Her carekê hinek gelaş melaş ji nava wan  
dide hev û tavêje  
Hineka ji ser refika jor dadixe, li ser ya jêr  
dideyne û hineka ji refika jêr hildide û wan li  
ser ya jor dideyne  
Lê hinek pirtûk hene, her û her mirov bi rêz  
radihêje wan, bi dilovanî destên xwe bi ser  
wan de tîne, tozê ji ser wan diweşîne, çend  
rêzan ji wan dixwîne û her û her wan li ser  
refika jor wan dideyne.

## *Dara Mazî*

Li welatê me

Xelk çêdibin û dimrin

Çem ti carî ranazin

Zevî zer dibin

Bênder tijî dibin

Xort, simbêlên xwe ba didin

Keç keziyên xwe dihûnin

Pîrejin serpêhatiyên xwe dibêjin

Çiya şehîdên xwe himbêz dikin

Tenê dara Mazî şîpya ye

Nobetdar e

Ew şahid e

Rasera her tiştî ye

Tenê yê ji wê bilintir

Xwedê ye.

## *Bavê Ciwan (2)*

Hîn

Her sibeh

Tu ji derî ve tê û

Rojnama rojane di destê te de ye û

Tu

Nûçeyên giring

Bi dengê bilind dixwînî

Da ku ez li metbexê

Bibihîzim.

Hîn

Her sibeh

Dengê mifta te tê guhê min

Ku tu ji deriyê hewşê ve tê û

Ez dibezim pêşiya te

Kîsa ji destê te digrim

Tu ji min re dibêjî:

Tu dizanî îro min li sûkê kî dît?

Ez dibêjim:

Ji Qamişlo bû?

Tu dibêjî:

Erê!

Û ez pê dikevim

Navê mirov, nas û cîranên me yên berê

Yeko.. yeko dibêjim,

Heta ku tu bêjî: Belê ew e.

Hîn

Em bi hev re dadikevin û

Tu ji min re dibêjî:

Emîra! Destê min bigre

Da tu di van kaşan de ne kevî!

## *Qamişlokî*

Ku te carekê toza salan

Ji ser pelê darên wê

Ne şûştibin

Tu ti cara ne giryayi, û

Ku Tava Temûz û Tebaxê

Dêm û ruwê te

Dax ne dabin

Qamişlo te nas nake!

Ku agirê tûtinê

Cedew di nava tiliyê te de

Çê ne kiribin

Ezê çawa naskim ku tu

Qamişlokî yî?!

Ku te ji Cîrnîkê, ta Hilêliyê

Gav bi gav

Ne pîva bê

Çawa dê tu Qamişlo nas bikî!

Heger

Ku te heriya Zivistana wê havînê jî

Mîna Hena zavatiyê

Bi cilên xwe ve ne hilandibe

Tê çawa durûvê xwe ji Qamişlo  
bistînî?!

Heger berya siet dudwê şevê

Tu vegehihayî mala xwe

Wê çawa malî yên te te nas bikin?!

Heger destên te û

Çavên te û

Deriyê te

Hemi û herdem

Ne li ser piştê vekirî bin

Xelk wê çawa nas bikin ku tu

Qamişlokê yî?!



**Hûr û mûr**



## *Çav*

Heger hûn nehêlin, ez vê cîhanê, wek ez  
dixwazim bibînim  
Van herdû çavan jî ji ruwê min derînin.

## *Kiras*

Ew kirasê ku doh me ji hêviyên xwe re dirûtî  
Îro li bejna wan nayê.

## *Dem*

Vê demê  
    dilên xelkê  
        di berîkê wa de ne  
Ramanên wan  
    di zikê wan de ne.

## *Pênûs*

Çendî tu pênûsa xwe tûj bikî  
Ew çend çekên giran kuh dibin.

## *Pêşwazî*

Îro bi dehan pê nûs  
Di mala me de  
Xwîn di rehên wan de zuha bûye  
Çendî li ber xwe dikevim  
Ku ji nişkave  
Helbestek li deriyê hestê min xe  
Ezê çawa pêşwaziyê lê bikim.

## *Gotin*

Amade me ku heft salan  
Wî li piştta xwe bikim û  
Li dora dinyayê bigerînim  
Yê ku ji min re bibêje ka  
Çend rû ji yek gotinê re hene!

## *Gund*

Hîn bihna nanê tenûrê  
Di bêvla min de ye  
Leystikên zaroktiyê  
    Li ber çavê min nin  
Hîn şîretên pîrejinan  
    Li bîra min in  
Hîn rez û pez û cot  
    Berf û baran  
    Têne xewnên min  
Ji lewra dizanim hê ez gundî me  
    Bajarvaniyê ez ne dizî me.

## *Ronî*

Mirovê ku  
    roniyê ji çavên xwe winda dike  
    Ji kolanê ditirse.  
Lê,  
Mirovê ku  
    ronahiyê ji dilê xwe winda dike  
    Kolan ji wî ditirsin.

## *Berzanî*

Dema

Ez

li bin lingê te rûniştim û

Min

kêla ber serê te ramûsand

Ez

ji bindestiyê

tahir bûm.

## *Navên pêşî*

Berê pêşî anî

Navê wê kir Kurdistan

Yê diduwa

Navê wî kir Berzanî û

Yê sisiya

Navê bavê xwe lê kir.

## *Gulav*

Min, ti gulav li bejn û bala xwe wernekirin  
Piştî ku ji min re gotin:  
Bihna welat ji te tê.

## *Welato (1)*

Evîna min ji te re  
biqasî êşa te ye  
Ji lewra evîneke eşkereye û  
Ti kiras li bejna wê nayê.

## *Welato (2)*

Dayik,

xwe qurbana zarokan dikin  
Xwişk,  
xwe qurbana bira dikin  
Dotmam,  
xwe qurbana pismaman dikin  
Evîndar,  
xwe qurbana hevûdû dikin  
Vêca hemî bi hev re  
Bi yek carî  
xwe qurbana te dikin.

## *Hêvî*

Bawer kin!  
Ku bihêlin hêviyek  
ji sênga min biwerihê  
Ser tehtekê jî  
wê şîn bibe.

## *Tirs*

Tirsa min a herî mezin ewe ku  
Rojekê  
Valahî  
jiyana min tijê bike.

## *Ji cîhanê re*

Min ne dixwest ku  
Ez Di dideya kurdîniya xwe de  
Noq bibim  
Winda bibim  
Lê,  
ma ez çibkim  
Tu deryayên dî  
ez hînî,  
avjeniya xwe ne kirim.

## *Azadî (1)*

Nizanim ka wê  
Evîna azadiyê  
Min li pey xwe bibê kûderê  
Lê ez baş dzanim ku  
ez ji pey wê venagerim.

## *Azadî (2)*

Her ku mirov  
Gavekê  
Ji azadiyê dûr bikeve  
Dê du gavan  
Ber bi mirinê ve here.

## *Şehîd*

Her dilopek ji xwîna şehîd kî  
Deryak ji gemara bindestiyê  
Dişo

## *Sername*

Mala me,  
    di sînga gund de ye  
Gundê me,  
    di sînga çiyê de ye  
Çiyayê me,  
    di sînga Kurdistanê de ye  
Kurdistan,  
    di sînga min de ye.

## *Jiyan*

Dema ku em  
    jiyanê li xwe bikin kavileke wêran  
Wê hêvî û bîranînên me jî  
    bibin mar û dûpiştik

## *Evîn*

Em hemî qalikek valane  
Berya ku evîn bikeve hundirê me

## *Helbest (1)*

Ew helbesta ku  
bihna nanê tenûrê jê neyê  
bihna axê jê neyê  
bihna helbestê jî jê nayê.

## *Helbest (2)*

Çendî têm da hilweşim  
Helbestek tê dikeve bin çengê min  
da ku dîsa li ser lingê xwe rawestim.

## *Helbestên min*

Helbestên min  
bi nanê kurdan xwedî dibin  
Ders û dewrên xwe  
ji koçk û civatên wan distînin  
li ber derî û pencerê wan  
diponijin.

## *Gul*

Gul

Li xwîna xwe dibûre  
Li ber serê xwe yê jêkiriî û  
Temenê xwe yê qurmiçandî jî,  
nakeve

Tenê,

ku wê bidin destê evîndarekî

Yan jî,

destê azadîxwazekî.

## *Nezanî*

Ji nezaniya xwe

Me dijmin zana didît

Ji nezaniya dijmin

Ji wî hebû ku

Dikare

Miletekî

Di qutîkekê de

Biçîne!



## *Rê*

Rê û rêçik  
Li welatê me  
                    Teng û zirav man  
Ji ber ku me ne dixwest  
            Em pêl gorên şehîda bikin û  
Ne jî  
            Gul û kulîlka  
                    Biperçiqînin.

## *Ev pênuş*

Tenê ev pênuş  
                    Kilîta dilê min e  
Tenê,  
            Ew dikare  
                    Deriyê wî veke  
                    Bikeve hundirê wî  
                    Li nav deşt û çiyayên wî yên  
                                    Bê sînor  
  Bigere.



## *Zarokî*

Eve pêncî sale

Ez zaroktiya xwe didin balgehê xwe de  
diveşêrim

Belkî rojekê

Leşker

Ji kolanên me dûrbkevin

Da daykamin bibêje:

Tu jî here bileyze.

## *Li gundê me*

Li gundê me

Xelkê

zarokên xwe

ji ber çavê Helîmê vedişartin

Digotin:

Çavê Helîmê mirova dikuje!

Xwezî û

Sed hezar car xwezî

Ez bi çavê Helîmê bimrama û

ne bi derdê xerîbiyê.

## *Pakrewan*

Heta ku li jiyânê ne

Jiyana me diparêzin

Dema ku ji jiyânê bardikin

Jiyana wan

Ji jiyana me ya bê jiyân re

Dibe jiyân

**Hûr û mûr**

**Beşê bê nav**



- Tenê ruwê xelkê  
Neynika helbestên min in.
- Çi sûde ji demeke nû heye  
Heger em xwe nû nekin!
- Min ruwê van rûpelan reş kir û  
wan ruwê min sipê kirin
- Eve hezar sale  
Ez ji ber derdan direvim  
Di dawiyê de  
Ez û wan  
rastî hev tên
- Yê ku tiştek ne çandî  
Li hêviya baranê jî namîne.

- Ez  
bi zimanê dilê xwe di axivim
- Ti carî  
gotinên qelew û vala  
zikên birçî têt nakin
- Divê ez li ser xwe bigrîm  
Heger ku  
min nezanî ez li ser kesî dî bigrîm
- Tenê yê ku ji bo jiyane dimre  
ew dijî
- Azadî jî  
Mîna me  
bê cih û war e  
Her ew li dora cîhanê digere û  
Em jî  
li pey digerin.

- Gelo em şehîd xelat dikin  
Yan ew me xelat dike
- Xwezî bihnvedana min a dawî  
Li ber dîwarekî ji dîwarên gundê me ba
- Em ew ên çûyîn  
Bi xwe re  
Sax bihêlin  
Çêtire ku  
em bi wan re bimrin
- Mirov  
Ku di nava êtûnê de be  
Çêtire ku  
Êtûn di nava wî de be
- Ez û evîn cêwî ne  
Bi hev re çêbûne  
Ji sînga van çiyay  
Firşik bûne

- Tîpên min  
 Di destên merdan de  
                                     dibin gul û  
 Di bin lingên çepelan de  
                                     dibin bizmar
  
- Welat bi mirovê xwe bihaye  
 Mirovê bê welat  
                                     sêwiyekî windaye û  
 Welatê bê mirov  
                                     kavilekî valaye
  
- Agirê sobê  
                                     serma laş dikuje  
 La, tava azadiyê  
                                     serma can dikuje
  
- Çendî dilê min mezine jî  
 Lê,  
                                     birîna di hundirê wî de  
   jê mezintire

- Ewên ji ber çavê me vedimirin,  
Di hundirê me de vêdikevin.
- çavê min  
Mîna pelekî ewr in  
Dikarin  
Her zeviyeye tî û miçiqî  
Bimêjênin
- Her ku ez hêviyekê diçînim  
Rojek ji temenê min  
vedimire
- Mirov bi xwe  
Mîna defterekê ye  
Roj û meh û sal  
Hemî êş û janên xwe  
Li ser rûpelên wê  
Dinivîse û  
Diçe û ji me dibûre û  
Me li şûna xwe dihêle.

Dawî

وهشانين وهزارهاتا رهوشه نيرى و لاوان  
 رېقه بهريا گشتى يا راگه هاندن و چاپ و به لافكرنى  
 رېقه بهريا چاپ و به لافكرنى - دهوك

سال	ژمارا لاپهران	نرخ	نقيسه	ناڤى په توكى	12
2011	170	5000	وهر گيرز ئينگليزى: اديان جھيل	ابابولوزيا گهردى و خانهدى	1-1
2011	400	5000	وهر گيرز ئينگليزى: ديان جھيل	مايكروبايولوژى	2-2
2011	208	5000	د. عارف حيتو	رومان خوديكا ژيانتيه - ج 1	3-3
2011	105	4000	د. فاضل عمر	شورشين جه ماوه رى نهره ب	4-4
2011	243	5000	شفان قاسم	رولى دهقى دنافا كرنا درامايا كورديدا	5-5
2011	293	5000	حسين صديق عقراوي	تطور الاعلام الكردي (1991- 2003)	6-6
2011	226	5000	د. جمال خضير الجنابي	الرواية التاريخية (دراسة في الادب الروائي محمد سليم سوارى نموذجاً)	7-7
2011	152	5000	ته حسين نافشكى	تافگه ليگه ريان ل روتههيا پرا جينيوتى	8-8
2011	143	4000	نزار محمد سعيد	هن ناليين جفاكى كوردى دكولتورى گه ليرى دا	9-9
2011	85	4000	فههمى بالايى	هينرى ماتيس (1869 - 1954)	10-10
2011	247	5000	عزته فندي	شوو نواريين ده فهرا دهوكى	11-11
2011	445	4000	هزر فان عبد الله	سترانين عه مه رى عه فدى ژ كانيا چرافى	12-12
2011	316	5000	رنا فتحي الأومري	فن و عمارة الكورد	13-13
2011	272	4000	فاضل عمر	فه رهنگا زمانى په رتيا / كوردى - په رتيا	14-14

2011	252	4000	رفعت رجب جهمال	15- بزافا شانووی (ل ناکری) – نامیدی – زاخو / شانووا قوتابخانهیان ل دهوکی 1970 – ( 1990 )
2011	40	2000	دیا جوان	16- <i>Gotinên li ber mirinê</i>
2012	170	5000	وه رگیر ژ ئینگلیزی: دیان جھیل	17- سالیئ پنهابه ری ژ ژيانا نيسحان نوری پاشا
2012	212	4000	یوسف صبری	18- نالایی کوردستانی – فه کولینهک دیروکی ل سهر نالا د میژووا کوردستانی
2012	182	3000	کومه لا ههلبه ستفانیئ گهنج	19- داستانە کا ههلبه سارتی
2012	192	4000	شورشقان عادل احمد	20- زمانغانیا تیکستی
2012	112	4000	دلبرین عبدالله علی	21- جودا کرنا کاری لیکدای ژ کاری خودان تهواو کهر و بهر کار
2012	258	4000	ارشاد حینو	22- داداییم دهۆزانا نو بخوازا کوردیدا (1985-2003)
2012	152	3000	ن. کۆبو ئایی و. شالیکیژی بیکیس	23- نیچیرا کۆلا (شانویا ب ههفت وینهیان)
2012	148	3000	دیا جوان	24- ژ بو ته (ههلبهست)



JI BO TE



Helbest

0024

ريشه به ریا چاپ و به لافكرنى - دهوك  
ژمارا سپاردنى 2012 - 2217

چاپخانه ههوار / دهوك، كوردستان